Bi Bîn Fereyî

Dr. Zerdeşt Haco - Zaradachet Hajo
Adar 2009

Bi bîn fereyî
û bi baweriyeke ku naye hejandin
Tu bûyî deydîka ji kevir ji mirovayetiyê re.

Li ber şewqa rojê
û di nav parastina tariyê de
Te bê westan zarokên xwe
Amed, Heskîf, Nînewa
û Gilgamiş anîn
ew şîrdan û kirine
kulîlkên şaristaniyê.

Niha ew divin ji Amedê ziman bidizin
û Heskîvê di zikê Te de bixeniqînin.
Belê hêza Te yî kevin
û qêrîna Te yî can
liberxwedana zarwên Te mezin dikin.

Bîna Te çendî fere ye,
Dicle, deydîka mirovayetiyê?